Samhällsvetenskapsprogrammet

2016-09-28

Bernameya civaknasiyê

KURMANJI

Utbildningsinfo

Skolverket

Barnameya civaknasiyê bernameyeka amedekirinê ji bo xwendina bilind e û bidestxistina dîplomeya amadebûna ji bo xwendina bilind armanca wê ye.

Bernameya civaknasiyê ji te re ye yê ku hez dike bizane ka çawa mirov û civak bi awayên cuda îro pêş dikevin û kar dikin. Ev xwendin ji bo domkirina xwendinê di warekê fireh yê civaknasiyê de di perwerdeya bilind de bingeh e.

SÊ PISPORIYÊN CUDA

Reftarnasî

- Tu dê zanyariyan li ser mezinbûn, civakbûn û hevahengiya mirovî werbigirî. Tu dê baştir tê bigehî ka mirov wek kes, endamê komekê û welatiyê civakekê çawa tev digere. Tu dê têkildarî, fêrbûn û rêberiyê bixwînî.

Medya, înformasiyon û komunîkasiyon

- Tu dê zanyariyan li ser rola medyayê di civakê de, teknîka medyayê, rojnamevanî, înformasiyon, reklam û awayên dualî yên komunîkasiyonê werbigirî. Tu dê bixwînî ka çawa medya tesîrê li nêrînên mirovan û têgihiştina cîhanî dike.

Civaknasî

- Tu dê zanyariyan li ser avahiya civakê û şertên jiyana mirovan werbigirî. Tu dê bi rêya şirovekirin, wesifkirin û bikaranîna metodên civaknasî zanîna xwe li ser pirsên civakê yên cuda firehtir û kûrtir bikî.

Tiştên ku tu di vê bernameyê de fêr dibî

Tu dê zanîna xwe li ser rewşên civakê li Swêdê û cîhanê pêşde bibî. Tu dê zanyariyan li ser ka çawa kes û civak hevahengiyê bi hevûdin re dikin û ka çawa şertên jiyanê yên mirovî di dîrokê de hatine guhertin. Tu dê mirovî wek kes, endamê komê û welatiyê civakê bixwînî. Tu dê avahî, çalakî û wezîfeyên civakê bixwînî. Tu dê ji aliyên aborî, civakî û siyasî ve li ser pirsên demokrasî, têkildarî, exlaq, zayend, jîngeh û desthilatê hizir bikî.

Bername weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernameya civaknasiyê de madeyên lîseyê yên hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê. Di bernamyên amadekirina ji bo xwendina bilind de, tu kursên teorîk yên zêdetir ji yên bernameyên pîşeyî dixwînî.

Madeyên taybetmend yên hevbeş yên bernameyan ev in: felsefe, zimanên serdem û psîkolojî.

Îmkan heye ku tu di bernameyê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bernamekûrkolîn (programfördjupning). Ev dikare madeyên wek wêne, afirandina dîjîtal, berhemên fîlm û tv-yê, felsefe, cografiya, komunîkasiyona grafîk, civaka ava, hiqûq, huner û kultur, rêberî û rêxistin, komunîkasiyona medyayî, zimanên serdem, perwerdekarî, psîkolojî, zanîna civakê û civaknasî bin. Ji xwendingehê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendingehê bipirse ka kîjan kurs hene.

Awayên xebatê

Di vê bernameyê de, tu dê rêbazeka zanistî û rexneyî ya wisa pêşde bibî ku tu pê fêr bibî biryarê bidî ka îdîa li ser rastiyan ava bûne û nirxên ku di corên cuda yên çavkaniyan de hene ji hev cuda bikî. Tu dê bi metodên hilsengandina çavkaniyan li agahdariyan bigerî, wan vewijêrî/bineqînî û li ser bixebitî.

Tu dê şiyana xwe ya hevkarîkirin, behremendbûn, karkirina bi serê xwe, berpirsiyarîgirtin, dîtina îmkanan, înîsiyatîvgirtin û xebitandina fikiran bo kiryaran pêşde bibî.

Projeya lîseyê

Tu dê di dawiya Bernameya civaknasiyê de projeyeka lîseyê amade bikî. Tu dê pirsekê hazir bikî û karekê mezin yê ku li ser warên zanyarî yên giring yên bernameyê ava dibe plan bikî, pêk bînî û hilsengînî.

Balkişandin

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên taybetî yên xwendineka bilind bi dest bixî. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pîşeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de bibijêrî.